# ŞERKEFTIN

www.tevgerakomunist.com | Hejmar: 01 | Dîrok: Adar 2021 | DENGÊ ŞOREŞ Û AZADIYÊ



# NEWROZ PÎROZ BE

# نوروز مبارك

Newroz ji hêla gele me yê Kurd ve bi hezar salan e li vê xakê tê pîrozkirin. Newroz roja vejînê, roja raperînê ye. Em Newrozeke din li ser xakên ku şoreşa me rizgar kiriye pêşwazî dikin. Weke ku di dîroka me de Kawayê Hesinkar li hember Dehaq serî rakir û gele xwe ji zaliman rizgar kir, gazî û şehîdên me yên canfeda jî li Rojava û Bakurê Sûriyeyê ev xeta serhildêr û berxwedêr gîhandin asta serkeftinê. Ew Kawayê Nûjen ên welatê me ne.

Îroj Dewleta Tirk a faşist û mêtînger weke Dehaqê zalim li hemberî gelên me êrîşên xwe yên hovane didomîne. Li Efrînê êrîşa wan a tîmsalê Kawayê Hesinkar helbet ne bê sedem bû. Li Serê Kaniyê û Girê Spî Dewleta Tirk a mêtînger dixwaze ku hemû heyinên gelan tune bike ji ber ku dizane di çanda gelan de her tim berxwedan heye. Ew dixwaze vê reha berxwedanê qut bike, lê vala ye.

Em Newroza 2021'an ji bo rizgarkirina Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî ji dagirkeriya Dehaqên zalim, ji bo parastina welatê xwe li hemberî gefên dagirkeriya Dewleta Tirk a faşîst veguherînin roja mezinkirina berxwedan, têkoşîn û yekîtiya gelên Rojava û Bakurê Sûriyeyê.

Em Newroza 2021'an li tevahî gelên me yên Rojava û Bakurê Sûriyeyê pîroz dikin. Bijî Newroz.


يحتفل شعبنا الكردي بعيد نوروز في هذه الأرض منذ آلاف السنين. نوروز يوم الانتفاضة يوم التجديد
نرحب بنوروز آخر على الأراضي التي أنقذتها ثورتنا. كما في تاريخنا ثار كاوا الحداد على ديحق. وأنقذ شعبه من الظالمين ، هكذا وصل شهدائنا في روج افا وشمال سوريا إلى هذا الخط من التمرد والمقاومة إلى مستوى الانتصار.
هما كاوا التجديد لبلدنا. واليوم ، تواصل الدولة التركية الفاشية والديكتاتورية هجماتها الوحشية على شعبنا مثل ديحق الظالم في عفرين ، لم يكن هجومهم على كاوا الحداد بلا سبب بالتأكيد. في سري كانيه وكري سبي ، تريد الدولة التركية تدمير كل وجود للشعب لأنها تعلم أن هناك دائمًا مقاومة في ثقافة الشعب. تريد كسر إرادة المقاومة هذه ، لكنها فارغة.
نحول نوروز ٢٠٢١ إلى يوم المقاومة ونضال ووحده متزايدة لشعوب روج افا وشمال سوريا من أجل تحرير عفرين وسري كانيه وكري سبي من الطغيان للدفاع عن بلادنا ضد تهديد الاحتلال التركي الفاشي. نحتفل بعيد نوروز ٢٠٢١ مع كل شعوبنا في روج افا وشمال سوريا. يعيش نوروز


**2** ROJEV: *Welatparêziya Sosyalîst: Li Kurdistanê Komûnîstbûyîn*

**4** BÎRDOZÎ: *Fermandarê Nemiran Baran Serhat*

**6** ÇIRÛSK: *Pêşeroja Şoreşê*


## EM LI SER ŞOPA BARAN SERHED IN



**Fermandar Baran Serhat di parastin û avakirina şoreşê de rêberekî nebez bû. Di çeperên berxwedanê de, di her kêliyên jiyanê de keda rêheval Baran Serhat heye. Rêheval Baran di êrîşa Dewleta Tirk û çeteyên wê de şehîd ket. Em di 2'emîn salvegera şehadeta Fermandarê Nemiran Baran Serhat de we vedixwînin bîranînên ku em ê roja 23'ê Adarê li hemû bajaran li dar bixin.**

# Welatparêziya Sosyalîst: Li Kurdistanê Komûnîstbûyîn




Welatparêziya sosyalîst ji hêla komûnîstên Kurdistanê ve cewhereke bîrdozî ya ku ji mafê hebûna pratîkî (emelî) diwelide û nûnertiya xwestek û bîrdariya bersivdayina wê dike hildigire. Cewhereke sosyalîst ku rizgariya civakî ya çîna karkeran û binestan armanc dike. Di vê wateyê de armanca pênaseyeke nasname; di navbera xwe û rêxistin, tevger û partiyên din de kişandina xeta cudatiyeke bîrdozî hildigire. Lê komûnîst di bîrdariya wê de ne ku ev xeta cudatiyê heta ku weke têgih bimîne ji razberiyê nikare xilas bibe. Pêwîst e bê zanîn ku mafê hebûnê ya komûnîstan tena serê xwe taybetmendiyeke mîsogeriyê dabîn bike hilnagire/nikare hilgire. Ji ber vê sedemê pêwîst e em bin wê bi xetên qalind xêz bikin ku welatparêziya sosyalîst ji bo me ji li ser wateya wê fikirandina têgihî û razberî hîn wêdetir bi nirx e.

Ji vir ve em li ser wateyê dikarin bigihêjin du encamên giştî ku yên komûnîst li welatparêziya sosyalîst bar dikin. Weke ya yekemîn û pêşdatir welatparêziya sosyalîst, pênaseya bi giştî ya xeta komûnîstan a ji bo çar perçeyên Kurdistanê ku bi stratejiya wan a şoreşa yekbûyî re hatiye girêdan e. Ya duyemîn, welatparêziya sosyalîst, şênberiyeke ku ji hêla raman û rêgezên giştî yên teoriya Marksîst Lenînîst ve li Kurdistanê hatiye gîhaştin baneke bîrdozî, bi bernameyeke şoreşger ve hatiye gîrêdan û bi vê ve tevahiya wê ya armancan hatiye dabîn kirin, weke siyasî û kardarî bi sazkirinê ve û bi tevgera hêzên rêxistinî ku wê xetê şênber bikin ve hatiye girêdan e. Bi vî awayî di armanca pêşdatir a ku ji bo em welatparêziya sosyalîst ji bo xwe bikin rojev em bingehekê diyar dikin, ev; pirsgirêkên rêxistinî û siyasî yên pêşketina Tevgera Komûnîst a li Kurdistinê bi zelalî û fehmbar derxistina asta bîrdariyê û bi kardarî çareserî dîtin e.

Ger ku em hûrgiliyan bidine aliyekî, ji bo me hêmana tevahî ku rê pêş me bike ev e; parçeyên Kurdistanê li hember kapîtalîzmê xwedî hêz û piştevanên çînî yên têkoşîna şoreşger a civakî ne. Rizgariya civakî li Kurdistanê jî ji bo bê çareserkirin di rojevê de ye. Sosyalîzm, pêdiviya Kurdistanê ye jî. Ji ber vê jî xeta welatparêziya sosyalîst, ji bergeha berjewendiyên çîna ku nûnertiya wê dike tevlî têkoşîna azadiya Kurdistanê dibe, têkoşîn dike û dixwaze ku desthilatiyê ava bike.

Ji bilî hin kapîtalîstên ku qedera xwe bi mêtîngeriyê ve girêdane û hin axeyên erdan hemû netew pêdiviyê bi azadiya neteweyî dibînin. Proleteryaya bajar û çolwaran, xizanên bajaran, gundîtiya biçuk û navîn, burjuvaziya biçuk a bajaran, gundîtiya dewlemend, yên kapîtalîst, axe û begên erdan! Çarçîve ev qasî fireh e. Ji xwe şiklên hebûna polîtîk ên têkoşîna neteweyî jî hem di xeta reformîst de hem jî di xeta şoreşger de têkoşîna bernameyên cuda dide der. Ji bo burjuvaziya Kurd em dikarin pêdiviya wê weke ji dewlemendiyên ku hêzên hilberîner ên neteweyî afirandine pargirtina hîn zêdetir kurte bikin. Bi wateya giştî li holêye ku burjuvaziya Kurd ji çareseriyeke di nav mêtîngerî û şikla dewleta demokratîk a burjuvaya kapîtalîst de bi esasê xwe bi bidawîkirina mandeleya netewî sînordar e amade ye.

Diyar e ku di vê çarçîvê de burjuvaziya neteweya bindest bi hin beşên serdest ên diyar re amadeye ku li hev bike û diyar e ku esasê bernameya wê jî ev e. Di rêya şoreşgerî re tesfiyekirina mêtîngeriyê derveyî rojeva burjuvaziya Kurd e. Ji holê rakirina polîtîkaya mandeleya neteweyî, naskirina zimanê dayikê û nasnameyê, di mercên mîsogeriya makeqanûnî de naskirina temsîliyeta neteweyî ya hevbeş a parlementer, wesfa neteweyî ya tevlêbûn û piştgirîdayina têkoşîna azadiya neteweyî ya burjuvaziya Kurd a îro ye. Tevahiya van mercan, ji bo burjuvaziya Kurd ji ber ku derfetên desthilatiya xwe ya siyasî û berfirehkirina berjewendiyên xwe yên aborî yên li ser netewên kêmtirîn ava dikin bes tên dîtin.

Ast û çînên civakî ku pêdiviya azadiyê bi awayekî herî berfireh tînin ziman ji burjuvaziya biçuk a bajar û çolwaran pêk tê. Encamên wêranker ên taybetmendiya kapîtalîst a mêtîngeriyê, ji ber ku li ser ast û çîna burjuvaziya biçuk bandorên civakî û aborî ku bi zexta neteweyî re bûye yek diafirîne hêst û çalakiyên wan ên "welatparêzî" wesfên hîna radîkaltir ên azadîxaziya neteweyî hildigire. Li hemberî ku gewdeya esasî ya netew û tevgera neteweyî ava dike dîsa jî ev beş ji ber hin taybetmendiyên xwe yên çînî nikare bername û xetek bîrdozî ya azad bide pêş.

Ji pêdiviya proleteryaya Kurd, xizanên bajaran û xizanên gundî heger em çarçîveyeke giştî xêz bikin, em dikarin vêna wiha tarîf bikin: ji bo azadiya civakî bêsekin tevlêbûna têkoşîna azadiyê bûyin û rêveberiya wê kirin, enerjiya azadiya neteweyî ne ji bo desthilatiya burjuvaziyê ji bo desthilatiya demokratîk û şoreşger a çîna karkeran û poreleteryaya çolwaran hêz kirin. Ev, pêwîst dike ku proleteryaya bajar û çolwaran ji aliyekî bi çînên ku li aliyê welatparêz ê netewê disekinin re peymaneke qismî, bi merc, derbasdar bike, li aliyekî din jî li hember burjuvazî, axayên erdan ên feodalî, xwediyên erdan ên kapîtalîstên netewî azad birêxistin bibe û li gorî armancên dawîn têkoşîn bike. Proleteryayeke (û hêza wê ya pêşeng, mûfrezeya wê ya birêxistin) ku bi nêrîneke wiha bi hemû hebûna xwe tevlî têkoşîna azadiya neteweyî nabe, ala azadiya neteweyî li herî pêş hilnade di rastiyê de wê bêr bi apolîtîkbûyineke ku tu teorî nikare wê mafdar derxe ve biçe. Wê di pratîkê de pişta xwe bide erkên xwe yên dîrokî û siyasî.

Welatparêziya sosyalîst di şoreşa me ya demokratîk de ji bo ji nû ve avakirina civakî û aborî rêgeza rêvebir e. Di heman demê de ji bo pêşeroja me ber bi sosyalîzmê ve bê avakirin rê nîşan dide. Yanî welatparêziya sosyalîst îroj di vê astê de nêrîna esasî ye.

Peymana stratejîk a bi gele Ereb re ji bo şoreş ber bi Sûriyeyê ve belav bibe û derbasî asta sosyalîst bibe bi naveroka xwe ya şoreşger xeta herî rast e. Welatparêziya sosyalîst di parastina mafên neteweyî yên gelê me de, di xurtkirina yekîtiya di nava gel de, di avakirina baweriya di nava gelan de firehiya bîrdariyê dide. Dawî, yekîtiya Kurd û Ereban, yekîtiya kedkarên Kurd, Ereb û neteweyên din wê di avakirina cîhaneke sosyalîst de cihekî grîng bigire. TKŞ bernameya welatparêziya sosyalîst esas digire û avakirina vê xetê erk dipejirîne.

# الوطنية الاشتراكية الطريق الوحيد للخلاص

ثورة روج افا والوطنية الاشتراكية عزز شكل الانتفاضات العربية في سوريا تخلف الإسلام السياسي. على الرغم من تصويرهما في البداية على أنهما معارضة سورية وديمقراطية ، سرعان ما ظهر أنهما غير ديمقراطيتين ولا قيمة لهما للشعب. بسبب الفراغ القيادي للثوار الديمقراطيين ، تجمع قسم كبير من الناس حول التنظيمات الإسلامية السياسية. أدت العلاقات التي كانت قائمة فقط على المصالح مع الإمبرياليين والدول المتخلفة في المنطقة إلى عزل حلفائهم إلى حد كبير. وبهذه الطريقة قمع المقاومة الشعبية للتخلص من الأسد ومجموعة من في السلطة. حولت القوى التي تقف وراء الإسلاميين السياسيين في سوريا مطلب ديمقرطية الشعب السوري تدريجياً إلى حرب جهاد. عقد اتفاقيات مع منظمات مثل منظمتك. مع ابتعاد مقاومة الشعب السوري عن الديمقراطية ، أصبحت أراضي سوريا من الفاشيين إلى الوراء مكانًا للتجمع. أصبحت هذه المنظمات فروعًا للدول الإمبريالية والمتخلفة ، في مواجهة النضال من أجل التحرير الوطني والديمقراطية ، بدلاً من الأسد كقوة ضد الثورة التي تحاول إخماد الانتفاضة الثورية بالدم.

ولأن المعارضة السورية كانت بعيدة كل البعد عن الديمقراطية ، لم يكن للإسلام السياسي أي ملامح متقدمة وشعبنا الكردي اتخذ مسارًا مختلفًا. لم تكن حليفة للنظام البعثي ولا للمعارضة السورية. ابتعد عن هؤلاء ، طور خطه المجاني وأخبره أيضًا بالطريقة الثالثة. أرادت كردستان روج افا أن تنال حريتها السياسية بهذه الطريقة الثالثة. بإسقاط قوات النظام والقضاء على القوى الإسلامية في روج افا ، حقق شعبنا حريته الوطنية. كانت ثورة روج افا في خط التحرر الوطني عندما بدأت في بناء نظامها على شكل كانتونات. كان انخراط الشعوب العربية قوياً حيث امتدت الحرب ضد داعش والنصرة إلى المناطق العربية. حتى قبل نهاية حرب التحرير الوطنية ، أبرمت القيادة الثورية اتفاقًا مع القبائل العربية ، كان هذا متسقًا مع البنية الاجتماعية في روج افا وكان خطوة صحيحة واستراتيجية نحو التحول الديمقراطي. في الوقت الحالي ، تمر الثورة في روج افا.

وشمال سوريا بمرحلة تحققت فيها الحرية السياسية ، وضمان الحرية السياسية ، واكتمال المرحلة الأولى من الثورة. لا تزال ثورة روج آفا ديكتاتورية في أجزاء أخرى من كردستان ، حتى لو كانت ذات طابع ثوري وشعبي. إن مسألة توحيد الأجزاء الأربعة لكردستان أمر جوهري. لذلك ، لم تفقد الثورة الكردستانية شيئًا من أهميتها السياسية. في ظل هذه الظروف لا يزال برنامج الثورة الوطنية في روج افا وشمال سوريا قائماً.

أكملت ثورة روج آفا دفاعها بنجاح ضد العصابات.

انتقلت الثورة من مستوى الحرية الوطنية إلى مستوى الديمقراطية والديمقراطية، وبدلاً من الوطنية ، كان لابد من استبدال الوطنية الاشتراكية. من اليوم فصاعدًا ، سيبين لنا خط الوطنية الاشتراكية الطريق في تحرير عفرين وكري سبي وسري كانيه والدفاع عن ثورتنا. هذا يعني أيضًا اتباع برنامج يسلط الضوء على الديناميكيات الأساسية للمجتمع.

الدفاع عن ثورتنا الشعبية ضد الهجمات ، سينجح تحرير أراضينا المحتلة بحرب تنير ذكرى الوطنية الاشتراكية. إن الذكرى التي ستدمر خطط ثورتنا والشرق الأوسط ، والتي ستمنع شعبنا من الاستسلام لأمريكا أو روسيا ، هي أيضًا ذكرى الوطنية الاشتراكية. من المعروف أنه على مستوى الإمبريالية العالمية ، يجب خوض النضال مع الإمبريالية والرأسمالية معًا. على مستوى الإمبريالية العالمية لا يمكن أن يكون المرء ضد الإمبريالية دون أن يكون ضد الرأسمالية. لذلك ، فإن الدفاع عن الثورة في روج افا ضد الدولة التركية الفاشية والدفاع عن الثورة ضد الإمبرياليين يفرضان نفس خط الوطنية الاشتراكية والذاكرة المرتبطة بها.

هناك أيضًا حركات في روج افا متحالفة مع الدول لقد استيقظنا على .ENKS المتخلفة والإمبرياليين ، مثل هذه الأحزاب وغيرها من الأحزاب المناهضة للثورة التي لا تستطيع أن تدمر ثورتنا بالسلاح ، ونحاربها سياسياً وفكرياً ، ولمنع إلحاق الضرر بالثورة ، وانهاء علاقاتها مع الشعب وعزله. ذكرى الوطنية الاشتراكية تحدث.

نهج نظام البعث لا يظهر أي إيجابية تجاه ثورتنا. في الوضع الحالي من المستحيل بدء حركة بالسلاح ضد ثورتنا. لكنه يقول إن العودة إلى قوته السابقة ستعيد أيضًا الوضع في سوريا قبل الثورة. لذا فإن عدونا الآخر هو نظام البعث. الأسد يريد تدمير ثورتنا. أي ضمان آخر لثورتنا هو ديمقرطية سوريا. ستكتمل الثورة الأولى لثورتنا بالثورة السورية. من المعروف أنه خلال الثورة ظل النظام قائماً سياسياً واقتصادياً وعسكرياً. هذا الوضع يمهد الطريق لفكرة العودة إلى النظام. إنه يعيق ويؤخر موظفينا من قطع جميع العلاقات مع نظام البعث. إن تنظيم الناس حول أفكار الوطنية الاشتراكية سيمهد الطريق للعودة. الوطنية الاشتراكية هي المبدأ المرشد في ثورتنا الديمقراطية من أجل إعادة البناء الاجتماعي والاقتصادي. كما يوضح الطريق لبناء مستقبلنا نحو الاشتراكية.

وهذا يعني أن الوطنية الاشتراكية هي الفكرة الرئيسية على هذا المستوى اليوم. الاتفاق الاستراتيجي مع العرب لنشر الثورة في سوريا والانتقال إلى المستوى الاشتراكي هو الخط الأكثر مباشرة مع محتواها الثوري. تعطي الوطنية الاشتراكية بعدا واسعا لحماية الحقوق الوطنية لشعبنا ، ولتعزيز الوحدة بين الناس ، وبناء الثقة بين الشعوب.

أخيرًا ، ستلعب وحدة الأكراد والعرب واتحاد العمال الأكراد والعرب والأمم الأخرى دورًا مهمًا على برنامج TKŞ في بناء عالم اشتراكي. يقوم .الوطنية الاشتراكية ويقبل بناء هذا الواجب




## TKŞ: Şoreşa Rojava Berdewamiya Serhildana Qamişlo Ye

Di 12'ê Adara 2004'an de li Qamişlo ji hêla Rejîma Baas ve komkujiyek hate kirin. Di misabeqayeke gogê de ji hêla milîsên ku Rejîma BAAS ji Dêrazorê anîbûn ve gava yekemin a komkujiyê hate avêtin. Serokê Şaredariya Qamişlo leşger û polîsên Rejîmê jî derbasî stadyumê kir û di vê êrîşê de hejmarek ji Kurdan ve hat qetilkirin. Di merasîma ku ji bo yên jiyana xwe ji dest dane de careke din Rejîmê êrîşî gel kir û bi tehavî bi dehan kes qetil kir. Rejîmê ji ber ku ji destkeftiyên li Başurê Kurdistanê ditirsiya û nedixwest gele Kurd ji vê serkeftinê piştgiriyê bigire gav bi gav ev komkujî birexistin kir.

Gelê Kurd li hemberî van êrîşan serî netewand û ji Dêrikê heta Efrînê û Şamê li hemberî vê komkujiyê rabû ser piyan. Gel, sazî û nokteyên rejîmê kir hedef û bi dirûşma "Kurdistana Azad" dest bi raperînê kir. Ev raperîn li hemberî tune hesibandina neteweî, tune hesibandina zimanekî û zilma Rejîmê ya bi dehan salan bû. Li hemberî vê raperînê Rejîma Baas mecbur ma ku gava paş de biavêje û hin mafên Kurdan nas bike.

Gelê Kurd bi hêz û tecrûbeya ji Serhidana Qamişlo girt ber bi Şoreşa Rojava ve meşiya. Bi Şoreşa Rojava gelê Kurd li hemberî serdestiya faşist a Baas'î mafê xwe yê netewî bi dest xist. Şoreşa Rojava veguherî şoreşa gelên Bakurê Sûriyeyê û nakokiya ku dewletên serdest di navbera netewan de ava kiribûn ruxand. Îroj gelên herêmê di jiyaneke azad û demokratik de bi hev re li hemberî hişmendiyên faşist têdikoşin. Şoreşa Rojava rêya çareseriya pirsgirêkên herêmê ye.

Em careke din kesên ku di Komkujiya Qamişlo de jiyana xwe ji dest dane bi bîr tînin. Em ê Şoreşa Rojava ya ku berhema vîna şehîdan e bi têkoşîna hevpar heta dawiyê biparêzin.



***Gelên Qamişlo di 17'emîn salvegera komkujiyê de li stadyûmê hatin gel hev, kujer lanet kirin û kesên jiyana xwe ji dest dane bi bîr anîn. Di serî de şêniyên Dêrazorê û bi hezaran şêniyên herêma Cizîrê û deverên cuda yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên Kurd, Ereb û Suryan beşdarî çalakiyê bûn. Di dawiya çalakiya li Stada Şehîdên 12`ê Adarê de, tîma futbolê ya herêma Cizîrê li hemberî tîma Dêrzorê bi 2-1 bi ser ket.***

# Fermandarê Nemiran Baran Serhat

Rêheval Bayram Namaz (Baran Serhat) di sibeha 23'ê Adarê ya 2019'an ji aliyê çeteyên hevkar û dewleta Tirk ve li Serê Kaniyê di encama êrîşeke nemerdane ku hat lidarxistin de bû nemir. Rêheval Baran wekî her roj ku li ser erkên xwe yên şoreşger bû, di saetên sibehê yên zû de şehîd ket.

Rêheval Baran endamê komîteya navendî û endamê komîteya Kurdistanê, nûner û fermandarê partiya me yê Rojava bû. Rêheval Baran Serhat di heman demê de wek endamekî damêzrênêrê partiya me, wekî komûnîstekî Kurdistanî di dîroka 20'ê Sibata 1970'ân de hat cîhanê. Zaroktî û salên ciwantiya xwe yên destpêkê li Wanê derbas kir. Newekheviyên civakî û polîtîqayên asîmîlasyonê di hilbijartina wî ya şoreşgertiyê de bi bandor bû. Bandora têkoşîna azadiyê ku li Kurdistanê zêde dibû li ser rêheval Baran jî bandorên şoreşger afirand. Li gorî baweriya rêheval Baran şoreş û azadî tenê bi şerkirinê dihat bi dest xistin. Ji ber vê li dijî faşîzm û mêtîngêriyê bû parêzvanê têkoşîna çekdarî.

### Ew Jiyaneke Bi Berxwedanê Dagirtî Bû

Baran Serhat 15 salên jiyana xwe ya şoreşgertiyê di zindanên dewleta Tirk a faşîst de bi berxwedanan derbas kir. Salonên dadgehan zîvirand mewziyên ku tê de kapîtalîzm, mêtîngeriya înkarok û faşîzmê dadgeh dike û armancên xwe yên şoreşger qîr dike. Rêheval Baran Serhat di girtîtiya xwe ya dawî de beşeke girîng ji parêznameya xwe bi zimanê Kurdî kir. Tadeyên ku li ser zimanê xwe yê dayikê şermezar kir û di odeyên dadgehan de bi dirûşmeyên Kurdî qîrîn kir. Di axaftina xwe ya Kurdî de piştî ku bal kişand ser parçebûna çar parçeyên Kurdistanê, polîtîqayên înkar û asîmîlasyonê û têkoşîna azadiya netewî ya gelê Kurd yek bi yek rewşa parçeyan nirxand. Rêheval Baran Serhat di rewşa herî dijwar de silav şandina ji şoreşa Rojava û şervanên wê re ji bîr nekir. Bi gotina "Li Rojava herêma Kurdî tê damezrandin, di ev parçeyê biçûk de deriyekî mezin vedibe" herkes daweyî bazdana şoreşa Rojava kir. Piştî neh mehê ev gotinên bi hêvî dagirtî di Tirmeha 2014'an de li Rojava li ser erkên xwe yên şoreşger bû.

### Ew Têkoşerê Erkan ê Herî bicoş û Xurt Bû

Rêheval Baran têkoşerekî MLKP'ê yê xurt, pêkhênêr û parêzvanekî nebez ê çalakî û ramanan bû. Şoreşê banga ku derê bikiraya, pêwîstiyên şoreşger li ku derê hebana wî bazda wir. Cûdatî nexist nav erk û karan. Hemû erkên xwe bi coşeke mezin pêk anî. Di hemû domayiya jiyana xwe ya şoreşgertî de gelek erkên şoreşger bi serkeftî bi cih anî. Wek Endamê Komîteya Stenbolê yê MLKP'ê, Sekreterê Komîteya Adanayê, Sekreterê Komîteya Stenbolê, Sekreterê Rêxistina Bakurê Kurdistanê, Nûnerê Rojava, Endamê Rêxistina Kurdistanê, Endamê Komîteya Navendî û Endamê Komîta Cîbicîker a Komîteya Navendî berpirsiyartî girt ser milên xwe. Erka xwe çi dibe bila bibe, ji bo xurtkirina şer bi têkoşerî, cidîtî, biryardarî û xwestekeke mezin xebitî. Di her qadê de fehm, tecrube û qabiliyetên xwe xist tevgerê. Şêweya rêheval Baran şêweya bidestxistina serkeftinê bû.

Rêheval Baran dengê Kurdistanê yê komûnîst bû. Ew di afirandin û pratîkirina wesfa komûnîst a Kurdistanî ya MLKP'ê de bû rêber. Wî li dijî mêtîngeriya faşîst dirûşmeya Kurdistana azad qîr dikir. Wek Kawayê Bakurê Kurdistanê, Baranê Rojava ji bo azadî û şoreşê kedeke bêsînor da. Biryardariya wî di kêliyên ku li dijî astengiyên ku dijwar û nayê derbaskirin xûya dikin de kêm nebû.

### Ew Fermandarê Şoreşa Rojava yê Fidayî Bû

Wekî ku di parastina şoreşê de fidakariyên mezin nîşan da, heman fidakarî fêrî rêhevalên xwe jî kir. Di her kêliya ku MLKP'ê di eniyên şer de bilind kiriye de ew hebû. Tu carî li paş nesekinî. Rêheval Baran Serhat û partiya xwe MLKP'ê bi cih girtina di hemû hamleyên pajijkirina DAÎŞ'ê de singa xwe dan ber bedêlên mezin. Komûnîstên ku li Efrîn û Serê Kaniyê li dijî êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk a mêtînger û faşîst li ber xwe dan û şehîd dan, wek fermandar û şervanên ku di fermandariya rêheval Baran re derbasbûyine di eniyên herî pêş de şer dikirin.

Ne tenê li her quncikekî Rojava, li Şengalê jî şopên rêheval Baran heye. MLKP'ê û fermandarê wê Baran Serhat ku li çiyayê Şengalê ala azadî û şoreşê mezin kir, li dijî êrîşa qirkeriya ku Êzîdî bi destê DAÎŞ'ê rû bi rû hatibûn parastina gelan kirin, dîsa ked û hewldana wî di dilê gelê Êzîdî de cih girt.

### Ew Nûnerê Xeta Enternasyonalîst Bû

Rêheval Baran Serhat, ji bo yekbûna hêzên şoreşger û ji bo ku karibin di heman eniyê de şer bikin jî ked da. Ji bo ku şoreşa Rojava bi gelên cîhanê ve bigîhîje hev û ji bo ku şoreşgerên cîhanê di eniyan de biparêzin di pêvajoya avabûna Tabûra Azadî ya Enternasyonalîst te berpirsiyartiyên pêşeng girt ser milên xwe. Şoreşgerên ku ji hemû deverên cîhanê hatin şoreşa Rojava di kesayeta heval Baran Serhat te naskirin, ji wî fêrî şoreşê bûn û di fermandeya wî de di cepheyan de cihê xwe girtin. Şoreşa me îroj ger li erdnigariyeke ku sînoran derbas dike tê naskirin û ger ku ji hemû deverên cîhanê tên Rojava di vir de kedên mûtewazî yên rêheval Baran hene.

### Ew Hem Fermandar Hem Avakerê Şoreşê Bû

Dîsa piştî ku rêveberiyên xweser ên kantonên Rojava bi şêweya federasyonê birêxistin bûn, xebatên ku di bingeha gelê Rojava xwedî li federasyonê derbikevin û xwe di komînan de bi rêxistin bikin de hatine meşandin mînakeke din e. Rêheval Baran Serhatê ku ji bo girseyîbûna şoreşê hewl da, ji bo xurtbûna şoreşa jinê jî hemû hêz bi dirûşmeya "Em şoreşê bibin hundirê malan" seferber kir.

Wî her tim digot " rêya xurtkirina parastin û avakirina şoreşa Rojava û Bakurê Sûrî bi awayekî hîn xurtir bi gîhaştina şoreşê bi gelê Ereb û gelên din ve gengaz dibe. Di vê bingehê de jî li ser têkîliyên avakirina hîn xurtir bi gelê Ereb ve lêhûrbûna ser rê û rêbazên tevlîkirina parastin û avakirina şoreşê ya wan çêdikir.

Rêheval Baran Serhat, di avakirina FOC'a Elîşêr Denîz ku biratiya gelê Kurd, Ereb û gelên Rojava yên din xurt dike û erkên leşgerî yên şoreşa me bi rihekî mezin yê têkoşer



dibersivîne ji dîtina erkên girîng ên ser milên xwe paş de nesekinî. Ligel ramana azadiyê berpirsiyartiyên exlaqî fêrî gelek şervanan kir.

### Yên Ku Ew Şehîd Kirin Ên Ku Têkçûna DAÎŞ'ê Jiyankirin In

Em ên ku rêheval Baran Serhat şehîd kirin nas dikin. Em wan ji şerê qirêj û bêbext ku li dijî şoreşa Rojava û Bakurê Sûrî didin meşandin nas dikin. Hêzên şoreşê yên Rojava û Bakurê Sûrî 8 sal e bi şerê ku sing bi sing meşandin de têkçûnên mezin bi dijmin dane jiyandin. Axa dawî ya ku sîstema xwe ya dawî li ser ava kiribûn roja ku rêheval Baran şehîd ketî ji destê çeteyên DAÎŞ'ê hat girtin. Têk çûn, radest bûn. Ev di heman demê de têkçûna polîtîqaya dewleta Tirk a mêtînger û faşîst û çeteyên wê bû.

Rêheval Baran Serhat ji ber vê sedemê hat şehîdkirin. Êrîşa sibeha roja ku DAÎŞ têk çû li dijî rêheval Baran hatiye lidarxistin, êrîşa tolhildanê ya dewleta Tirk û çeteyên wê bû. Dewleta Tirk a mêtînger û faşîst û çeteyên wê, bi êrîşkirina rêheval Baran nîşan didan ku wê dev ji dijminatiya xwe ya şoreşa Rojava û Bakurê Sûrî bernedin.

### Ew Kadroyê Rêber ê Xeta Welatperêziya Sosyalîst Bû

Şoreşa Rojava bi aresteyîbûna ber bi şoreşa Sûrî ve ji xwe re rêyek vekirîbû. Bi taybetmendiya xwe balê dikişine ser xwe. Wek rêberê xeta welatperêziya sosyalîst rêheval Baran di heman demê de kadroyekî rêber ku ji bo belavkirina şoreşa me têkoşiyabû.

Yên ku ew şehîd kirin wê tu carî negihîjin armancên xwe yên qirêj. Şoreşa Rojava û Bakurê Sûrî wê mezin bibe û li hemû Rojhilata Navîn bibe damêzrênerê pêşerojeke wekhev û azad. Ev ji rêheval Baran Serhat re û di şaxsê wî de ji bo tevahî rêhevalên me yên ku ji bo şoreşê ketine axê soza me ye. Partiya me qasî ku beşeke fidayî ye ew qas jî şitilgeheke Baran Serhadan e. Ew şitilgeh wê her tim zindî bimîne.

# قائد الخالدين باران سرحت



استشهد الرفيق بايرام ناماز (باران سرحت) ، صباح ٢٣ آذار ٢٠١٩ ، في هجوم جبان نفذته العصابات المتحالفة والدولة التركية في سري كانيه. الرفيق باران سرحت ، مثل كل يوم كان يقوم بواجباته الثورية ، استشهد في الساعات الأولى من الصباح. كان الرفيق باران عضوا في اللجنة المركزية وعضو لجنة كردستان وممثل وقائد حزب روج آفا. ولد الرفيق باران سرحت في ٢٠ شباط ١٩٧٠ كعضو مؤسس في حزبنا كشيوعي كردي. أمضى طفولته وسنوات مراهقته المبكرة في وان. كانت التفاوتات الاجتماعية وسياسات الاستيعاب مؤثرة في اختياره الثوري. كان للتأثير المتزايد للنضال من أجل الحرية في كردستان تأثير ثوري على الرفيق باران. بحسب الرفيق باران ، لا يمكن تحقيق الثورة والحرية إلا بالحرب. لذلك دافع عن الكفاح المسلح ضد الفاشية والديكتاتورية.

**كانت حياة مليئة بالمقاومة**

أمضى باران سرحت ١٥ عامًا من حياته الثورية في سجون الدولة التركية الفاشية مع المقاومة. تحولت قاعات المحاكم إلى مواقف يتم فيها محاكمة الرأسمالية وديكتاتورية الإنكار والفاشية وتقويض أهدافهم الثورية. قدم الرفيق باران سرحت جزءًا مهمًا من دفاعه باللغة الكردية أثناء اعتقاله مؤخرًا. وهتف الجناة بلغتهم الأم ورددوا هتافات كردية في قاعات المحكمة. في خطابه الكردي ، بعد التركيز على تقسيم أجزاء كردستان الأربعة ، قيمت سياسات الإنكار والاستيعاب والنضال من أجل الحرية الوطنية للشعب الكردي حالة الأجزاء الوحدة تلو الأخرى. لم ينسى الرفيق باران سرحت أن يحيي ثورة روج آفا ومقاتليها في أصعب المواقف. بالقول "المنطقة الكردية تؤسس في روج افا باب كبير سيفتح في هذا الجزء الصغير" ، أنهى الجميع الثورة في روج افا. بعد تسعة أشهر ، شغلت هذه الكلمات المفعمة بالأمل واجباته الثورية في روج افا في يوليو ٢٠١٤.

**كان أنجح وأقوى مقاتل من طراز أركان**

كان الرفيق باران مقاتلًا قويًا في حزبنا وملحنًا ومدافعًا صريحًا عن العمل والفكر. دعت الثورة إلى حيث يمكنه الشراء ، واحتياجات الثورة أينما فر. لم يتم التمييز بين الواجبات والمسؤوليات. قام بجميع واجباته بحماس كبير. طوال حياته الثورية قام بالعديد من المهام الثورية بنجاح. كان عضوا في لجنة الحزب الشيوعي الكردستاني في اسطنبول وسكرتير لجنة أضنة ، وسكرتير لجنة أسطنبول ، وسكرتير منظمة شمال كردستان ، وممثل روج افا ، وعضو في منظمة كردستان ، وعضو في الوسط. لجنة وعضو تنفيذي في اللجنة المركزية. مهما كانت مهمته ، فقد عمل بكل وجدية وحسم وبإرادة كبيرة لتكثيف الحرب. ضع خبراتك وقدراتك موضع التنفيذ في كل مجال. كان أسلوب الرفيق باران هو أسلوب تحقيق النجاح. كان الرفيق باران صوت كردستان الشيوعية. كان قائدًا في إنشاء وممارسة الشخصية الشيوعية الكردية لحزب الحركة الشيوعي المسيحي. وردد شعار كردستان حرة ضد الاستبداد الفاشي. مثل كاوا في شمال كردستان ، عمل باران سرحت في روج افا من أجل الحرية والثورة. لم يقتصر تصميمه على اللحظات التي بدت صعبة ولا يمكن التغلب عليها في مواجهة العقبات.

**كان قائد الثورة في روج افا وبينما أظهر تضحيات كبيرة**

قُدم نفس التضحيات لرفاقه. في كل لحظة أثارها حزبناعلى جبهات القتال كان هناك. لا تقف للوراء. دفع الرفيق باران سرحت وحزبنا كان ثمناً باهظاً لدورهم في جميع هجمات داعش. الشيوعيون الذين قاتلوا واستشهدوا في عفرين وسري كانيه الدين ضد المحتلين والفاشيين للدولة التركية ، قاتلوا في الخطوط الأمامية كقادة ومقاتلين تحت قيادة الرفيق باران. ليس فقط في كل ركن من أركان روج آفا ، ولكن أيضًا في شنكال ، هناك آثار لباران. دافع حزب التحرير وقائده باران سرحت ، الذي رفع علم الحرية والثورة على جبل شنكال ، عن الشعب ضد هجوم داعش على الإيزيديين ، ومرة أخرى بجهوده الدؤوبة دارت في نفوس الشعب الإيزيدي.

**كان ممثل خط الأممية**

الرفيق باران سرحت عمل أيضا من أجل توحيد القوى الثورية ولكي يتمكنوا من القتال على نفس الجبهة. من أجل توحيد ثورة روج افا مع شعوب العالم وإبقاء ثوار العالم في الخطوط الأمامية ، تحملتم المسؤوليات الرئيسية في عملية إنشاء كتيبة الحرية الأممية. الثوار الذين أتوا إلى ثورة روج آفا من جميع أنحاء العالم في شخص صديقنا باران سرحت ، علموا منه بالثورة وأخذوا مكانهم في الجبهات تحت إمرته. إن ثورتنا اليوم معروفة في جغرافيا تتجاوز الحدود ، واذا كانت قادمة من جميع أنحاء العالم إلى روج افا ، فهنا أعمال الرفيق باران سرحت المتواضعة.

**كان قائدًا ومؤسسًا للثورة**

ومع ذلك ، بعد أن تم تنظيم الإدارات المستقلة للكانتونات على شكل في روج افا اتحاد فيدرالي ، فإن العمل الذي يتم على أساس أمتلاك روج افا للفدرالية وتنظيم أنفسهم في الكومينات هو مثال آخر. الرفيق باران سرحت ، الذي حاول جعل الثورة جماهيرية ، حشد كل قواه من أجل تعزيز الثورة النسائية بشعار "الندخل الثورة في البيوت". لطالما قال إن "الطريق لتعزيز الدفاع عن الثورة وبنائها في روج افا وشمال سوريا ممكن من خلال تحقيق الثورة بطريقة أقوى مع الشعب العربي والشعوب الأخرى". على هذا الأساس ، ركز أيضًا على بناء علاقات أقوى مع الشعوب العربية من خلال ابتكار طرق ووسائل للانخراط في الدفاع وبناء ثورتهم الخاصة. الرفيق باران سرحت ، في تأسيس فوج" علي شير دانز" الذي يقوي الإخوان من شعوب روج افا الكردية والعربية وغيرها ويستجيب للمهمات العسكرية لثورتنا بروح نضالية عظيمة ، لم يخجل من تحمل مسؤوليات مهمة. جنبا إلى جنب مع فكرة الحرية ، تم تدريس المسؤوليات الأخلاقية للعديد من المحاربين.



**أولئك الذين استشهدوا هم الذين أعادوا الحياة لهزيمة داعش**

نعرف من استشهد الرفيق باران سرحت. نتعرف عليهم من الحرب القذرة المؤسفة التي يخوضونها ضد الثورة في روج افا وشمال سوريا. تعرضت القوات الثورية في روج افا وشمال سوريا لهزائم كبيرة على يد العدو في ٨ سنوات من الحرب. استولت عصابات داعش على آخر الأراضي التي بنوا عليها آخر نظام لهم يوم استشهاد الرفيق باران سرحد كان فشلًا لسياسات وعصابات الدولة التركية الدكتاتورية والفاشية. لهذا السبب استشهد الرفيق باران سرحت. كان هجوم الصباح على الرفيق باران ، يوم هزيمة تنظيم الدولة الإسلامية ، هجوماً انتقاما من الدولة التركية وعصاباتها. أظهرت الدولة التركية الدكتاتورية والفاشية وعصاباتها ، من خلال مهاجمة الرفيق باران سرحت أنهم لن يتخلوا عن عداءهم للثورة في روج افا وشمال سوريا.

**كان قائد الأركان في الخط الوطني الاشتراكي**

لقد مهدت ثورة روج افا الطريق للثورة السورية. يلفت الانتباه إلى نفسه بخصوصياته. كقائد للخط الوطني الاشتراكي ، كان الرفيق باران أيضًا من الكوادر القيادية التي حارب من أجل انتشار ثورتنا. أولئك الذين استشهدوه لن يحققوا أهدافهم القذرة. ستنمو الثورة في روج افا وشمال سوريا وتصبح مؤسس مستقبل متساوي وحر في جميع أنحاء الشرق الأوسط. هذا وعدنا للرفيق باران سرحت وشخصه لكل رفاقنا الذين دخلوا الأرض من أجل الثورة. حزبنا جزء من باران سرحت بقدر ما هو جزء من التضحية. هذه النبته ستكون دائما على قيد الحياة.



# Pêşeroja Şoreşê




Pêwîstiya Rojava û Bakurê Sûrî bi partiyeke nû ya komûnîst heye. Çima pêwîstî bi partiyeke komûnîst heye? Şoreş di asteke nû re derbas dibe. Wê yan di nav sînor û pirsgirêkên xwe yên pêşketinê de bifetise, yan jî li hember dorpêçkirinên paşverû ku hem ji derve û hem jî ji hundirîn in têk biçe. Sîleha herî xurt a pêşwazîkirina vê pêvajoyê bi persperktîfa çînî ya bi şêweyeke şoreşger ji bo îro wê partiyeke di formeke Marksîst-Lenînîst de bibe.

Li ser vê erdnigariyê partiyên ku xwe weke komûnîst bi nav dikin hene. Stratejiya van partiyan a şoreşê û binyatên wan ên rêxistinbûnê ne di wesfeke komûnîst û şoreşger de ye ku şoreşê fêm bikin û bandor li ser pêvajoyên pêş ên şoreşê bikin. Ji ber vê sedemê Tevgera Komûnîst a Şoreşger (TKŞ) di şêweyeke nû de, wek partiyeke têkoşer û şerker wê xwe birêxistin bike û bibe bersiva vê pêwîstiyê. TKŞ'ê wê bibe navendeke ku mirovên komûnîstên nû tê de birêxistin dibin û pêş dikevin.

TKŞ'ê di parastina şoreşa gelperêz û şoreşa azadixweziya jinê de cihê xwe digire. Li ser esasê xebateke birêxistinkirin û birêvebirina serkeftina avakirina saziyên aborî û civakî xwe ava dike. TKŞ'ê ji bo şoreşa demokratîk û gelperêz baregeheke sosyalîst û komûnîst e. TKŞ'ê ji bo bernameya şoreşa me ya demokratîk rêbertî, ji bo sînorên stratejîk û taktîkî vebuneke komûnîst e.

Şoreşa Rojava, di nav şert û mercên şoreşa herêmî de ber bi şoreşa Sûrî ve diçe. Qadên Rojhilat û Bakûrê Sûrî di bin konrtola hêzên şoreşger de ye. Navenda mêtînger a BAAS jî di pozîsyona dijî şoreşê de ye. Ji bo serkeftin û misogerkirina şoreşê bilindkirina têkoşînê, li dijî desthilatdariya BAAS bilindkirina zanebûn û rêxistinkirina karker û kedkarên Ereb, mezinkirina itîfaqa gelên Kurd û Ereb gaveke stratejik e. Ji ber vê yekê ji bilî alternatîfa rizgarbûna Rojava bi tena serê xwe bêtir, pêwîst e pêşveçûna yekbûyî ya şoreşger bê esas girtin.

Mijara pêşveçûna şoreşa yekbûyî wê yan di alî yekbûna çar parçeyên Kurdistanê de, yan jî di alî pêşveçûna şoreşa demokratîk a Sûrî de bibe, ev rewşeke ku li gorî dengeyên siyasî diyar bibe ye. Di rewşa heyî de di xala navendî ya bernameya me de şoreşa Rojava û Bakurê Sûrî disekine. Em ê vê şoreşê çawa pêş bixînin, ev mijar ji bo me mijareke sereke ye.

Sê parçeyên Kurdistanê yên din girêdayî destkeftinên şoreşa Rojava, ji ber sedemên wek destxistina lezaneke diyar, bandor li hev kirin û xurtkirina tevgerê, dikare derfetên pêşketina şoreşa yekbûyî ku gîrêdayî Tirkiyê, Îran û Iraqê jî derxîne holê. Tevgera Komûnîst van derfetên pêşketina şoreşger li ber çav digire û ji bo parastin û pêşxistina şoreşê têkoşîn dike. Tevgera Komûnîst pêşketina di vê qadê de wek parçeyeke şoreşa herêmî ya Rojhilata Navîn dibîne.

Tevgera Komûnîst pirsgirêka Rojhilata Navîn wek pirsgirêka bidestxistina azadiyên polîtîk û demokratîkbûnê digire dest. Lêgerînên di bingeha Îslamiyeta polîtîk, cûdatiyên mezhebî û cûdatiyên netewî de di dîrokê de her tim li dewsa çareseriyê rewşa bêçareserî û dijminatiya navbera gelan afirandin. Di bingeha wekhevî û edaletê de, bi vîna azad biryara avakirina jiyana bi hev re ku mafên netewên mêtîngeh û bindest, baweriyên bindest a kamil ava dike û pêşengtiya vê dike, bi vê re deriyê çareseriya şoreşger û demokratîk a pirsgirêka Rojhilata Navîn vedike. Şoreşa Rojava û Bakurê Sûrî di bingeha vê bername û nêrînê de temsîla çareseriya pirsgirêka Rojhilata Navîn dike.

Di hedefa stratejîk a tevgera Komûnîst de demokratîkbûna Sûrî disekine. Tevgera Komûnîst ji ber vê yekê li tevahiya Sûrî belavkirina sîstema şoreşger, gelperêz û demokratîk a Rojava û Bakurê Sûrî ji xwe re dike armanc. Tevgera Komûnîst di bin şert û mercên hevkariya emperyaliyetê û girêdana bi wê re û di herêmê de hebûna hêzên herêmî yên mêtînger de hedefa demokratîkirina Sûrî wek pirsgêrêkeke şoreşa me dibîne.

Tevgera Komûnîst bi şertê parastina destkeftinên şoreşa Rojava û Bakurê Sûrî bi Rejîma Sûrî ve yekîtiyên taktîkî yên wek xweseriya siyasî, federosyona ku misogeriyên zagonî digire dest şaş nabîne. Ji pê ve di destpêkê de rizgarkirina Efrîn, Serê Kaniyê, Girê Spî û Bab, Azez, Cerablûsa ku di bin dagirkeriya dewleta Tirk a mêtînger de ne, di nav erkên xwe yên sereke de dihesibîne.

Şoreşa me; di gava xwe ya yekemîn de dawî li têkilîyên BAAS'î yên desthilatdariyê aniye, saziyên devletê yên leşkerî û sîyasî tasviye kiriye, DAÎŞ têk biriye, azadiya gelê Kurd a netewî bi dest xistiye. Şoreşeke azadîxwaz a zayendî û demokratîk e. Bi vê şoreşê azadiyên polîtîk hatine bi dest xistin.

Partiya komûnîst a ku damezrênera pêşeng a proleteryayê ye, bi derfetên şoreşa heyî, ji bo derbasbûna asta şoreşa sosyalîst mecbûr e ku serkeftina şoreşa demokratîk mîsoger bike. Ji ber ku şoreş hîna hem di bin gefên Rejîma BAAS'î, hem di bin gefên dewleta Tirk a mêtînger û dewletên herêmê yên paşverû û dewletên emperyalî ku di herêmê de gihîştine asteke serdest de ye. Ji ber vê yekê şopandina stratejiyeke ku burjuwaziya biçûk a bajar û çolwaran, civatên bawerî û netewî, çîn û zayendên bindest li dora bernameyeke ku parastin û pêşvebirina şoreşê bike yek, esas e.

TKŞ'ê di her kêliya jiyanê de xeta şehîdan a fidayî û têkoşer dişopîne. Şehîd, gazî û birîndarên ku di nav parastin û avakirina şoreşê de bedêl dan, rêhevalên me û nirxên gelên me yên herî mezin in. Komûnîstên TKŞ'î pêkanîn û biserxistina xeyalên şehîdan ji xwe re erk dibînin. TKŞ'ê Nirxên ku şehîdan ji komûnîstan û civakê re hîştin di her şert û mercan de û li her derê diparêze û nirxên wan di asta herî jor de bilind dike.

Komûnîstên TKŞ'î bi nêzikatiya "şoreş şoreşa me ye" tevdigerin. Di têkiliyên xwe yên şoreşê de ne ji derve aksî wê ji hundir ve dinerin. Pirsgirêkan ji bo çaresariyê dinirxînin. Ji bo şoreşê keda xwe ya fîzîkî, ramanî û manewî derdixînin pêş. Xwedî li destkeftinên şoreşê yên civakî derdikevin. Ji bo parastina wan têdikoşin, desthiladariya demokratîk û şoreşger diparêzin.

Endamên TKŞ'ê li gorî newekheviyên ku ji dema berê de di nav gelên Kurd, Ereb, Suryan, Ermen, Tirkmen û hwd. de hatine avakirin tevnagerin, bi şoreşê ve siyaseta entarnasyonal ku bîrdariya gelan zêde dike pêş dixînin. TKŞ'ê li ser esasa rêxistinbûneke ku van bêbawerî û pêşdarazên di nav gelan de tune bike tevdigere.

Tevgera Komûnîst ku weke aborî, siyasî û civakî; bi çînên bindest, zayend, netew, komên netewî û komên baweriyê re azadiyên polîtîk bi dest xistiye û ji derfetên demokrasiyê sûd girtiye û gihîştiye asta rêbertiya şoreşê, xwe bi vê zanebûnê di nav girseyên gel de mezin dike û pêş dixîne.

# مستقبل الثورة

تحتاج روج افا وشمال سوريا إلى حزب شيوعي جديد .الثورة تدخل مرحلة جديدة. إما أنها ستختنق ضمن حدودها ومشاكلها التنموية ، أو ستفشل في مواجهة العبوات المتخلفة الخارجية والداخلية. إن أقوى سلاح للترحيب بهذه العملية من منظور طبقي بأسلوب ثوري اليوم هو حزب في شكل ماركسي لينيني.
هناك أحزاب في هذه الجغرافيا تسمي نفسها شيوعية.
إن استراتيجية أحزاب الثورة هذه وأسسها التنظيمية ليست في الطابع الشيوعي والثوري لفهم الثورة والتأثير على عمليات ما قبل الثورة. لهذا السبب ستنظم الحركة الشيوعية الثورية نفسها بطريقة جديدة ، كحزب مناضلين ومقاتلين ، وتستجيب لهذه الحاجة. ستصبح الحركة الشيوعية مركزًا حيث سينتظم وينمو أبناء الشيوعيين الجدد.




تأخذ الحركة الشيوعية مكانها في الدفاع عن الثورة الشعبية وثورة تحرير المرأة. يبني على أساس التنظيم الناجح والعمل الإداري لبناء المؤسسات الاقتصادية والاجتماعية. الحركة الشيوعية هي قاعدة اشتراكية وشيوعية لثورة ديمقراطية وشعبية. إن قيادة الحركة الشيوعية لبرنامج ثورتنا الديمقراطية هي انفتاح شيوعي على الحدود الاستراتيجية والتكتيكية.
ثورة روج افا في سياق الثورة الإقليمية تقود إلى الثورة السورية. تخضع مناطق شرق وشمال سوريا لسيطرة قوى الثورة. مركز القياس البعث هو أيضًا في موقف ضد الثورة.
إن زيادة النضال من أجل إنجاح الثورة وضمانها ، ورفع وعي وتنظيم العمال والعمال العرب ضد حكم نظام البعث هي خطوة استراتيجية لزيادة التحالف بين الشعبين الكردي والعربي.
لذا بالإضافة إلى البديل المتمثل في إنقاذ روج افا بمفرده.
من الضروري اتخاذ التطور الموحد للثورة كأساس سيكون موضوع تطوير ثورة موحدة إما لصالح توحيد الأجزاء الأربعة من كردستان ، أو في اتجاه تطوير ثورة سورية ديمقراطية ، وهو الوضع الذي ستحدده الأصوات السياسية. في الوضع الحالي ، تحتل الثورة في روج افا وشمال سوريا مركز جدول أعمالنا. كيف سنطور هذه الثورة هو موضوع رئيسي بالنسبة لنا.
الأجزاء الثلاثة الأخرى من كردستان مرتبطة بإنجازات ثورة روج آفا ، لأسباب مثل اكتساب سرعة معينة ، وتعزيز النفوذ ، وتقوية الحركة ، يمكن أن تفتح فرصًا لتطوير ثورة موحدة تشمل تركيا وإيران والعراق. تدرس الحركة الشيوعية هذه الفرص للتطور الثوري وتناضل من أجل حماية الثورة وتطويرها. ترى الحركة الشيوعية التقدم في هذا المجال كجزء من الثورة الإقليمية في الشرق الأوسط.
تتعامل الحركة الشيوعية الثورية مع قضية الشرق الأوسط على أنها مسألة اكتساب الحريات السياسية والديمقراطية. البحث على أساس الإسلام السياسي والاختلافات الطائفية والاختلافات الوطنية عبر التاريخ خلقت دائمًا حالة من عدم الاستقرار والعداء بين الشعوب بدلاً من إيجاد حل. على أساس المساواة والعدالة ، فإن الإرادة الحرة لقرار بناء حياة مشتركة تبني وتعزز حقوق الأمم المظلومة والمضطهدة ، المعتقدات الكاملة للمضطهدين ، وبالتالي تفتح الباب أمام حل ثوري وديمقراطي مشكلة الشرق الأوسط. تمثل الثورة في روج افا وشمال سوريا الحل لمشكلة الشرق الأوسط بناءً على هذا البرنامج والرؤية.

إن ديمقراطية السورية هي هدف استراتيجي للحركة الشيوعية الثورية لذلك تهدف الحركة الشيوعية إلى نشر النظام الثوري الديمقراطي والديمقراطي لروج افا وشمال سوريا في جميع أنحاء سوريا. الحركة الشيوعية بموجب شروط وأحكام التعاون الإمبريالي والانتماء إليها و يرى وجود قوى إقليمية متشددة في المنطقة هدفاً لثورتنا في ديمقراطية سورية.
لا يبتعد التيار الشيوعي عن التحالفات التكتيكية مع النظام السوري ، مثل الاستقلال السياسي ، وهو اتحاد يأخذ ضمانات قانونية ، طالما أنه يدافع عن مكاسب الثورة في روج افا وشمال سوريا. منذ البداية ، كان تحرير عفرين وسري كانيه وكري سبي وباب وعزاز وجرابلس ، الواقعة تحت احتلال الدولة التركية ، من بين مسؤولياتهم الرئيسية.
ثورتنا أنهت في مرحلتها الأولى علاقات مع نظام البعث والسلطات ، وحلّ مؤسسات الدولة العسكرية والسياسية ، وهزم داعش ، وفاز بالتحرر الوطني للشعب الكردي. إنها حركة تحرر جنسي وديمقراطي.
لقد تحققت الحريات السياسية من خلال هذه الثورة.
الحزب الشيوعي ، المؤسس الرائد للبروليتاريا ، مع إمكانيات الثورة الحالية ، ملزم بضمان نجاح الثورة الديمقراطية من أجل تجاوز مستوى الثورة الاشتراكية. لأن الثورة لا تزال تحت تهديد نظام البعث وكذلك تهديد الدولة التركية الديكتاتورية والدول الإقليمية المتخلفة والدول الإمبريالية التي وصلت إلى مستوى مهيمن في المنطقة. لذلك من الضروري اتباع استراتيجية توحد البرجوازية الصغيرة في المدينة وضواحيها والجماعات الدينية والوطنية والطبقات والأجناس المضطهدة حول برنامج يوحد حماية الثورة وتعزيزها.

خط شهداء الحركة الشيوعية يواصل خط التضحية والنضال. إن الشهداء والجرحى الذين ضحوا بأرواحهم في الدفاع عن الثورة وبناءها هم أعظم رفاقنا وقيم شعبنا. يرى الشيوعيون في الحركة الشيوعية أنه من واجبهم تحقيق أحلام الشهداء وتحقيقها. تحافظ الحركة الشيوعية على القيم التي تركها الشهداء للشيوعيين والمجتمع في جميع الظروف وفي كل مكان وترفع قيمهم إلى أعلى مستوى.
يعمل الشيوعيون في الحركة الشيوعية على نهج "الثورة هي ثورتنا". إنهم في علاقاتهم الثورية لا ينظرون من الخارج بل من الداخل. تقييم المشاكل لحلها. قدم عملك الجاد البدني والعقلي والروحي من أجل الثورة. يعتمد الملاك على إنجازات الثورة الاجتماعية. النضال من أجل حمايتهم والدفاع عن الحكم الديمقراطي والثوري.
يعتمد أعضاء الحركة الشيوعية على عدم المساواة التي كانت موجودة في الماضي بين الأكراد والعرب والآشوريين والأرمن والتركمان وغيرهم من الشعوب. مدمج في الشبكة مع الثورة تطور سياسة دولية تزيد من ذاكرة الناس. إنها تعمل على أساس منظمة تقضي على انعدام الثقة والأحكام المسبقة بين الناس.
الحركة الشيوعية الثورية اقتصادية وسياسية واجتماعية ؛ حقق الحريات السياسية مع الطبقات والأجناس والجنسيات والجماعات القومية والجماعات الدينية المضطهدة ، واستغل فرص الديمقراطية ووصل إلى مستوى قيادة الثورة ، ونمت وترسيخ نفسها بهذه المعرفة بين جماهير الشعب.





Belavokên **bername** û **danasîna TKŞ'ê** û bûltena **Raperîn** a Jinên Komûnîst ên Şoreşger hûn dikarin ji nûnertiyên TKŞ'ê peyde bikin.

Li ser malpêra ***www.tevgerakomunist.com*** hûn dikarin xwe bigihînin hemû agahiyên çalakiyên TKŞ'ê.

# تدافع النساء عن ثورتهن بالتنظيم





نظمت النساء الشيوعيات الثوريات ندوات في الحسكة وكوباني وقامشلو قبل الثامن من آذار ، اليوم العالمي للمرأة العاملة ، ودعوا إلى التزايد من النضال للدفاع عن ثورة المرأة.

عقد أعضاء المراة الشيوعية الثورية ندوة يوم ٥ مارس في حديقة القراءة في قامشلو وخلال الحفل الذي بدأ بالعرض السينمائي لأجل ٨ اذار ، تمت مشاهدة رسالة الفيديو التي أرسلتها ميشيلا هوفمان من ألمانيا ، والدة الشهيدة أيفانا هوفمان في روج افا.

في حديثه في الندوة ، أكدت جورجيت بانسومو ، عضوة الاتحاد النسائي الآشوري ، أن الثورة جمعت جميع النساء في المنطقة معًا أثناء نقل تاريخ ٨ مارس. كما لفتت بديعة مراد من دار المراة الانتباه إلى الحقوق التي اكتسبتها النساء مع ثورة روج آفا.

صرحت المتحدثة باسم المراة الشيوعية الثورية فاديا سيدو أن النساء يقاتلن ضد هيمنة الذكور في جميع أنحاء العالم. وقالت سيدو: "سندمر العقلية التي يسيطر عليها الذكور. ولا نقبل أي شخص يسلب حرية المرأة". لفتت سيدو الانتباه إلى إنجازات ثورة نساء روج آفا ، ودعت إلى زيادة التنظيم والنضال ضد الثورة والهجمات على حرية المرأة.

وفي ختام الندوة هتفت النساء شعار "المرأة ، الحياة ، المقاومة" .

### سندافع عن إنجازاتنا وحريتنا

وحضرت عشرات النساء الندوة التي أقيمت في حسكة تحت شعار "النساء ينظمن وتحمي ثورتهن". المراة الشيوعية الثورية نوجيان باران، كمتحدث في الندوة ، التي بدأت بالعرض السينمائي في ٨ مارس ، نقلت تاريخ اليوم العالمي للمرأة العاملة ، "بعد مذبحة العاملات المناضلات ، تم إعلان يوم ٨ مارس اليوم العالمي للمرأة بالقرار المتخذ بقيادة كلارا زيتكين ". مشيرة إلى أن النضال من أجل حرية المرأة قد تطور أكثر مع إضراب ، ولفتت باران الانتباه إلى الصعوبات التي تواجهها النساء بسبب العنف الاجتماعي للرجال. قالت باران: "نداءنا لجميع النساء العاملات هو المقاومة والقتال. دعونا نحتضن حريتنا بتوسيع الثورة" ، قالت باران.

في اللجنة ، تمت مشاهدة رسالة الفيديو التي أرسلتها ميشيلا هوفمان ، والدة المحاربة إيفانا هوفمان ، التي استشهدت في ٧ مارس ٢٠١٥ في قرية تل نصري . ذكرت المتحدثة باسم المراة الشيوعية الثورية فاديا سيدو أن هوفمان استشهدت أثناء قتالها ضد عصابة داعش من أجل حرية شعوب روج آفا ، "سوف نتبع طريق الشهيدة. وقالت "سندافع عن مكاسبنا وحريتنا".

### دعونا نزيد من النضال للدفاع عن ثورة المرأة

كما نظم أعضاء المراة الشيوعية الثورية ندوة بعنوان "تحيا إضراب المرأة / عمل المرأة ذو قيمة" في كوباني. تم عرض رسم تخطيطي لعمل المرأة أمام اللجنة. بتقديم معلومات عن تاريخ ٨ آذار / مارس ، لفتت نجاح كوباني ، ممثلة المراة الشيوعية الثورية ، الانتباه إلى حقيقة أن عمل المرأة أصبح غير مرئي في المجتمع الرأسمالي الذي يهيمن عليه الذكور. أكدت كوباني على دور المرأة في ثورة روج آفا.

نظم أعضاء المراة الشيوعية الثورية مهرجانًا نسائيًا في ٦ مارس في مبنى الحركة الشيوعية الثورية. في الخطاب الذي ألقي نيابة عن المراة الشيوعية الثورية في الحدث الذي حضره عشرات النساء ، تم توجيه دعوة لمحاربة العنف الاجتماعي للذكور والدفاع عن ثورة النساء ضد هجمات الاحتلال. واستمر الحدث بالموسيقى والرقصات بعد الخطاب.




## Pîrozbahiyên 8'ê Adarê

Jinên Rojava û Bakurê Sûriyeyê di 8'ê Adarê Roja Jinên Kedkar a Cîhanî de derketin qadan. Li Cizîrê, Firat û Şehbayê bi tevlêbûna bi hezaran kesan pîrozbahî hatin lidarxistin.

Li herêma Cizîrê ji hemû bajaran jinên Kurd, Ereb, Ermen, Suryan û Tirkmen ji bo ku 8'ê Adarê pîroz bikin li Qamişlo hatin gel hev.

Jinan dan xuyakirin ku wê xwedî li destkeftiyên ku bi fedakariyên mezin bi dest xistine derkevin û şoreşa xwe mezintir bikin. Jinan diyar kirin ku wê li hemberî hemû êrîşan berxwedanê bidomînin û nameya "Têkoşîna me mîsogeriya şoreşa jinê ye. Têkoşîna me heta hemû xakên me yên ku hatine dagirkirin werin rizgarkirin wê bidome. Jin tenê bi têkoşîn û rêxistinbûyînê dikarin rizgar bibin." dan.

Di çalakiyên ku li hemû bajaran bi coş derbasbûn de şano hatin pêşkêşkirin û govend hatin gerandin.





